# Rêzikên kerentîneyê

## Wateya "cudakirinê" çi ye, "kerentîne" tê çi wateyê?

"Cudabûn" tê wateya veqetandina demkî ya kesên pêketî yan gumanbar ji mirovên din ji bo heyama ku kesê di bin cudabûnê de dikare vayrusê veguhezîne. "Kerentîn" veqetandina guncaw a kesên têkiliyê ye, ango kesên ku têkiliya wan bi kesekî pêketî re hebûye.

## Mebesta cudakirin û kerentîneyê çi ye?

Cudakirin û kerentîne ji bo parastina me hemiyan ji tûşbûna bi koronavayrusê re dibe alîkar û armanc ew e ku belavbûna nexweşiyê sînordar bike.

## Kingê pêdivî ye ku ez werim cudakirin an kerentînekirin?

Erka cudakirin an kerentîneyê bixweber di bin Rêziknameya Kerentîneya Testa Koronayê de derbas dibe û rasterast pêk tê ji bo:

- Kesên ku testa PCR wan ji bo SARS-CoV-2 koronavayrusê erênî ye,
- Endamên malbata kesê ku testa wî erênî ye,
- Kesên ku nîşaneyên nexweşiyê nîşan didin an jî encama testa wan a bilez erênî ye û ji ber vê yekê testa PCR dane - heya ku encama testa PCR were ragihandin.

Kerentîneya kesên ku têkiliya kesane ya nêzîk bi mirovên pêketî re hebûne bêyî ku di heman malê de bijîn ji hêla rayedarên çavdêriya xwecihî ve bi şêwirdarîya digel beşa tenduristiya giştî ya têkildar re, li gorî qasa têkiliyê tê biryardayîn. Eger bi kêmî ve 10 deqeyan têkiliyeke nêzîk hebe, wek mînak di dema danûstendinê de, û devpêç nehatibe lêdan, dibe ku destûra kerentîneyê were dayîn. Di heman demê de dibe ku destûra kerentîneyê were dayîn eger ew mirov ji bo demeke dirêj odeyekê de bûbe ku hewaya wê neguheriye yan baş neguheriye. Hetanî eger destûra kerentîneyê neyê dayîn jî, divê kesên têkiliyê piştî têkiliyê 10 rojan bi qasî ku ji destê wan tê xwe cuda bikin.

Endamên malbatê û kesên din ên têkiliyê ne pêdivî ye ku di kerentîneyê de bin

- Eger derziya xurtkirinê lêdabin, an
- her duyan jî du caran derzî lêdabin,
- her çend ev tenê di navbera rojên 15an û 90î de piştî derzîlêdana duyem derbas dibe,
- yan pag bûne, ku tenê di navbera rojên 28an û 90î de piştî testa erênî tê dayîn.

Eger nîşaneyên nexweşiyê xuya bibin, ji kesan tê xwestin ku biçin xwe-cudakirinê û testê bidin.

## Gelo awarteyên rêzika kerentîneya xwebixwe hene ?

Rêzika kerentîneya ya xwebixwe tê şûna fermanên kerentîneyê yên kesane ku ji hêla rayedarên têkildar ên xwecihî ve tên derxistin. Eger rayedarekî têkildar yê xwecihî jî fermaneke kesane bide, naveroka wê dê ji yên di rêziknameya giştî ya fermanê de bi her awayî sertir be.

## Di dema cudabûn an kerentîneyê de divê ez çi ji bîr nekim?

Cudabûn û kerentîneyê tê wateya veqetîna li malê. Divê tivdîrên jêrîn bên girtin:

- rasterast vekişîna nav xanî, avahî yan cihê xwe
- di dema kerentînayê de ji cihê derneketin, ne ji bo çûyîna kirînê ne jî bo meşandina kûçikan. Divê êdî ev ji aliyê kesên din ve were kirin
- Têkiliya bi kesên din ên li derveyî xanî re divê bi hişkî were rawestandin
- Têkiliya bi mirovên din ên ne-kerentîneyî di hundirê xaniyî de divê herî kêm be. Piştre divê rêzikên girîng ên tevgerê werin şopandin, wek lêdana devpêçeke bijîjkî, paqijiya destan û guherîna têr a hewaya li odeyan.
- Divê ku bexçe, balkon an eywanê xwe bi kar bînin - lê ne ji bo hevdîtina mirovên din
- Divê hûn ji apartmanê dernekevin ji bilî bo mebesta pêkanîna testa koronayê ya PCR. Pir girîng e ku meriv rêzikên tevgerê bişopîne (ji hev dûr bin, rêzikên paqijiyê bişopînin, devpêçeke bijîjkî lêdin).

## Divê ez kê derbarê cudabûnê de agahdar bikim?

Kesên ku encama testa wan erênî ye (kesên pêketî) divê tavilê her kesê ku di van du rojên borî de ji destpêka nîşanan / wergirtina encama testa erênî têkiliya wan a kesane ya nêzîk pê re hebûye agahdar bikin. Ev yek bi taybetî girîng e eger têkilî ji bo demeke dirêj di odeyekê de bûbe ku hewaya wê neguherîbe yan baş neguherîbe, an di têkiliyek rasterast de (zêdeyî 10 deqeyan) be dema ku navbera 1,5 di nava wan de nebûbe û devpêçên bijîjkî lênedabin.

## Cudabûn an kerentîne çiqasî dikişîne?

Cudabûn an jî kerentînekirina kesên pêketî û têkiliyên wan hertim piştî 10 rojan bi dawî dibe. Eger testeke bilez a koronayê ya neyînî hebe an testeke PCR ya neyînî hebe û eger di 48 saetên borî de nîşaneyên wê tunebin, ew dikare piştî heft rojan zûtir were qedandin. Eger qasa CT ji 30 mezintir be bi testa PCRê jî bidawîbûna cudabûnê gengaz e. Divê bawernameya testê herî kêm mehekê ji bo kontrolên gengaz ên ji hêla rayedaran ve were xwedîkirin.

Ji bo karmendên li nexweşxaneyan, navendên perestaran, hwd., ji her gav testeke PCR wekî testeke belaş pêdivî ye.

Ji bo zarokên li navendên muqateya rojane û xwendekarên dibistanê, eger encamên testê neyînî bin heyama kerentîneyê heta pênc rojan jî kêm dibe.

## Eger ez rêzikên cudabûn/kerentîneyê neşopînim çi dibe?

Kesê ku rêzikan neşopîne qanûnê binpê dike. Ji bo vê dibe ku heta 25000 ewroyan cezayê pere were birîn.